HÊVÎ LGBTÎ

# RAPORA MAFÊ TENDURISTÎ Û CIHÊKARIYÊ YA LGBTÎ+ YÊN PENABER

NÎSAN / 2021

Avrupa Birliği sivil düşün

# RAPORA MAFÊ TENDURISTÎ Û CIHÊKARIYÊ YA LGBTÎ+ YÊN PENABER


**AMADEKAR**

Aylin Kırıkçı / Şêwirmenda Hiqûqî
Ercan Aydın / Pisporê Xizmeta Civakî
Selçuk Çelik / Psîkolog
Süleyman Sayar
Müzeyyen Araç



**WERGER**

Salah Ahmed (Erebî)
Sogol Ghaeli (Farisî)
Gökçe Katkıcı (Îngîlîzî)
Serhad Zinar (Kurdî -Kurmancî-)

“Ev rapor, di çarçoveya Bernameya Fikirîna Sîvîl a Yekîtiya Ewrûpayê de, bi piştgiriya Yekîtiya Ewrûpayê ve hatiye amadekirin. Berpirsiyariya naverokê bi temamî aîdî komeleya HÊVÎ LGBTÎ+yê ye û nerînên YEyê nîşan nade.”

# NAVEROK

06 Destpêka Raporê, Li Ser Metodolojî û Etîkê

09 Li Tirkiyê Mafê Tenduristiya Koçberan û Xizmetên Ji Koçberan Re Tên Kirin

12 Rêkeftinên Zagonî yên Derbarê Mafê Tenduristiya Penaberan De

15 Pirs-Bersiv û Tecrûbeyên Derbarê Tenduristiya Penaberan De

24 Veguhestina Pêvajoya Guncanî ya derbarê Zayendê De

27 Pirs-Bersiv û Tecrûbeyên Pêvajoya Guncanî ya Derbarê Zayendê De

31 Pirs-Bersiv û Tecrûbeyên Derbarê Ragihîna Mekanîzmayên Edlî de

35 Encam û Pêşniyar

# Kurtenav:

**ASM:** Navenda Tenduristiya Malbatan

**NY/UN:** Neteweyên Yekbûyî

**CEDAW:** Peymana Tunekirina Cihêkariyên cur bi cur li Hemberî Jinan

**CİMER:** Navenda Ragihandinê ya Serokkomariyê

**GSS:** Sîgortaya Tenduristiyê ya Giştî

**SGK:** Saziya Ewlekariya Civakî

**SSGSSK:** Qanûna Sîgortayên Civakî û Sîgortaya Tenduristiyê ya Giştî

**MSF:** Doktorên Sînornenas

**T.C.:** Komara Tirkiyê

**UNHCR:** Rêxistina Bilind a Penaberan ya Neteweyên Yekbûyî

**YUKK:** Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyaniyan

# DESTPÊKA RAPORÊ LI SER METODOLOJÎ Û ETÎKÊ

**“Rapora mafê tenduristiyê ya LGBTÎ+ yên penaber”** armanc dike ku di gihîştina mafê tenduristiyê de binpêkirinên mafî û cihêkariyên rû bi rû tên, di gihîştina xizmetên tenduristî ya LGBTİ+yên koçber û penaberan de tespît bike.

**“Peymana Navneteweyî ya Têkildarî Mafên Aborî, Civakî û Çandî”** ya ku Tirkiye jî piştgiriya wê dike, bi benda “Dewletên Alîgir yên vê Peymanê, ji bo bidestxistina mafê standart ê tendurîstiya laşî û hişî ya herî berz a ku her kes dikare bigihijê, dipejirînin” li welatê ku koçber û penaber lê dijîn ji hêla mafê tenduristiyê ve diparêze. Li gelek welatên ku weku Tirkiyeyê aliyê vê peymanê ne, penaber di mijara gihîştina mafê tenduristiyê û bi bikaranîna vê mafê de pêrgî astengiyan tên.

Gihîştina mafê tenduristiya penaberên li Tirkiyê niştecî ne, bi hejmara 6458 û dîroka 04/04/2013 di **“Qanûna parastina navneteweyî û biyaniyan”** de bi sernavê ´Gihîştina Xizmet û Alîkariyê` di benda 89an fiqreya sêyemîn û xala (a) yê bi hejmar 30988 û dîrok 24/12/2019 bi qanûna di rojnameya fermî de hatiye weşandin ve hatiye guhertin. Beriya sala 2019an qanûn bê guhertin, xwediyên statu û serîlêdanên parastina navneteweyî, bêyî ku di nava demekê de sînordar bin dikarîbûn di bin sîgortaya tenduristiyê ya giştî, gihîştina mafê tenduristiyê bigirtana. Bi sererastkirina dawiyê tengkirina vegirî mafê tenduristiyê, divê penaber ji qeyda parastina navneteweyî şûnde tenê dikare saleke jê sûd wergire. Bi vê yekê re di gihîştina mafê tenduristiyê de penaberên rastî tengasiya zimên û rewşên cûdayitî û h.w.d. tên. Bi vê qanûnê ku hate sînordarkirin, gihîştina mafê tenduristiyê hate astengkirin. Bi pandemiya Covîd-19ê re gihîştina mafê tenduristiyê ji bo penaberan dijwartir bûye.

Tirkiye, mêvandariya 4 mîlyon mirovên ku hewcedarê parastina navneteweyî ne, dike. Nêzîkî 3.6 mîlyon Sûrî di bin parastina demkî de ne û nêzîkî 323,000 serîlêderên parastina navneteweyî û xwedan statu ji neteweyên din hene. [1] Daxuyaniyek di vê mijarê de ji rayedaran tuneye ku ka çend kes digihêje xizmeta tenduristiya belaş.

Pandemiya Covîd-19, weku li her derê dinyayê li Tirkîyeyê jî herî zêde bandor li ser komên qirofek kiriye. Di çarçoveya civîna "IDAHOBIT-5" a Komeleya HEVİ LGBTİ+ de, tecrûbe û veguhastina LGBTİ+ yên koçber û penaberan di xala gihîştina mafê tenduristiyê de bingeha amadekirina vê raporê ava kiriye.[2]

Di serdema pandemiyê de koçber û penaberên LGBTÎ+ zêdetir hatin tenêhiştin û man bêpalpişt, di ev serdemê de bi taybetî gihîştina mafê tenduristî û mewzûatên ku dihatin guhertin di mijara bikaranîn a mafan re zordariyên ku jiyane gav bi gav zêdetir kirine.

Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ ku weku online dabû amade kirin û ji "Bernameya Mafên Tenduristiyê ya LGBTÎ+ yên Penaber " feyz hatibû girtin û "Rapora Mafê Tenduristiyê ya LGBTÎ+ yên Penaber" bi guhastina tecrubeyên koçber û penaber ên LGBTÎ+ ve hate amadekirin. Bernameya ku weku online du rojan domand pêşkeşî ji aliyê elçiyên tenduristiyê ve bi zimanê zikmakî yê koçber û penaberên LGBTÎ+ bi zimanê Erebî û farisî hate kirin.

Di çalakiya ku online hatibû kirin, agahî û tecbûrebeyên ku hatibûn parvekirin ji bo dengdanê dan ber vexwendîkaran û hate qeydkirin. Wan hemû dengên ku hatibûn qeydkirin piştî ku di asta deşîfrasyonê de hate bikaranîn, hatin îmha kirin. Ew kesên di çalakiyê de cih girtin ji bilî kesên ku di beşa xwe de pispor in, hemû agahiyên derbarê vexwendîkaran de bi veşartî hate anonîmkirin.

Di avabûna ev raporê de **"Mafê tenduristiyê ya Penaberan"** û di dema parvekirinên ev çalakiyê de derbarê mafê heyî yê tenduristiya penaberan de **"çalakiyên cihêkarî û mafê nexweşan yên LGBTİ+ yên Penaber"** Tomarkirinên deng ên li ser mafên nexweşên penaber û binpêkirinên mafan bi taybetî kesên LGBTÎ+ piştî ku hatin deşîfrasyonkirin û redaktekirin di raporê de cih girtin. Hemû agahiyên di raporê de cih digirin beriya ku

çalakî bê destpêkirin ji vexwendkaran ji aliyê Komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ bi forma destûra ewlehiya dîjîtal hatiye şandin û hatiye ewlehîkirin.
Di çalakiyê de; tevî LGBTÎ+ yên penaber, hekîmên tipî, elçiyên tenduristiyê (wergêr), pisporê xizmeta civakî, derûnnasê endamê komîsyona tenduristiyê ya HÊVÎ LGBTÎ+, parêzerê komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ û aktîvîstên komîsyona penaberan a HÊVÎ LGBTÎ+ piştgirî û alîkarî dane ev xebatê.

LGBTÎ+yên penaber ên li bajarên cûda yên Tirkiyê û bi tevî statuyên cûda dijîn pêşî bi tecrubeyên xwe di vê raporê de bi çavdêriya çawanî bi ronahiya agahiyên tecrûbeyên kesan re hatiye temamkirin. Di vê rapora ku tecrûbeyên kesan weku çavkaniya yekem cih digire, ji serdema pandemiyê di mijara tenduristî û mafên penaberan de mekanîzmayên gilîkirinê û di mijarên pêvajoya guncana zayendî ya transên penaber de cih daye pêşkeşan. Di mijarên pêvajoya guncana zayendî ya transên penaber de û di pêvajoya gihîştina tenduristiyê de binpêkirinên mafan bi tecrûbeyên xwe xistine rojevê.

---

**[1]https://www.unhcr.org/tr/wp-content/uploads/sites/14/2021/03/UNHCR-Turkey-Operational-Update-January-2021-TRKf.pdf**

**[2]https://m.bianet.org/bianet/lgbti/224608-multeci-lgbti-lar-pandemi-yi-anlatiyor-korkarim-pandemi-bitecek-ama-ayrimcilik-surecek**

# LI TIRKIYÊ MAFÊ TENDURISTIYA KOÇBERAN Û XIZMETÊN JI KOÇBERAN RE TÊN KIRIN

**Dr. F. Deniz Mardin:**
Ji bo vewxandinê spas dikim. Ez doktorê tenduristiya gel im. Piştî ya ku me di sala 2019an de perwerdeya bi navê "Elçiyên Tenduristiyê" çêkir, hinek pisporên me derheqê mafê tenduristiyê û gihîştina mafê tenduristiyê de dest bi pêşkeşiyan kirin. Tenê derbarê vê perwerdehiyê de dixwazim çend tiştan bibêjim. Ev perwerdehiya, Doktorên Sînornenas (MSF) û Komeleya Piştevaniyê ya Ardiçê bi hev re dabûn. Ji komeleyên cûda heval beşdarî vê perwerdehiyê bûn, ji aliyê tenduristiyê ve hatibûn wê rewşê ku êdî wan jî karî perwerde bidana. Di mijarên xizmetên tenduristiyê û tenduristiyê de baştir dibe ku agahdarî bi zimanê zikmakî bide dayîn û em wisa difikirin ku ev mafeke wan e. Pêşkeşiya ku wê îro bê dayîn ew ê hevaleka me ya elçiya tenduristiyê ye, bide, ez peyvê didim wê.

**Pirsgirêkên ku penaber û nemaze jî LGBTÎ+yên penaber di gihîştina xizmetên tenduristiyê de dijîn:**

- Astengiyên ziman, kêmasiya wergêran
- Burokrasiya sazûmanî
- Sîstema tenduristiyê ya tevlîhev
- Tevgerên xebatkarên tenduristiyê, LGBTÎ+ fobî, nîjadperestî û cihêkarî
- Di saziyên ku xizmet jê tên girtin, bê perwerdebûna xebatkarên tenduristiyê di mijarên LGBTÎ+yê de û nezanîn.
- Bêserûberiyên di şopandina ducaniyê û derziyên zarokan de

- Nebûn û nekirina şopandina nexweşên kronîk
- Pirsgirêkên ji hêla gihîştina tedawiyê ku nexweş rû bi rû dimînin
- Berî û piştî welidandinê xwestina mûçeyên zêde ji jinên penaber
- Beriya destwerdana acîl xwestina heq, destpênekirina tedawiyê, biderengxistina tedawiyê
- Di dema pandemiyê de zehmetiyên girtina randevûyan
- Fobiya HIV û stigmatîzasyona ku penaberên bi HIVê re dijîn dûçarî dimînin
- Paşvegerandina di ASMyan de (ne qebûlkirina nexweşên neqeyidkirî di asta yekemîn de)

Li Tirkiyê ji bo mafê tenduristiyê koçberan û pêşkeşkirina xizmetên tenduristiyê, divê serîlêdanên parastina navneteweyî(serîlêdanên penaberiyê) yan jî serîlêdanên parastina demkî hebe. Eger ew kes di yek demê de serî li saziyeke tenduristiyê jî bixe divê li ew bajarê ku îkamet dike bimîne û divê aktîvasyona sîgortaya tenduristiyê ya giştî kiribe.

Penaberê ku bi GSSê yan SGKyî be û bixwaze ji xizmeta tenduristiyê sûdwergirin, dikarin ji hekîmên malbatê, navendên tenduristî yên koçberan û ji servîsên acîl yên nexweşxaneyan weku bêpere dikarin xizmeta tenduristiyê hildin.

Penabarên ku SGKya wan tunebin jî dikarin ji “ navendên tenduristiya malbatan” ku ew asta yekemîn e, bêpere xizmeta tedawiyê bigirin. Ji bo xizmetên nexweşxaneyan hewce ye mûçeyeke bê dayîn. Xizmetên acîl yên nexweşxaneyan beriya ku xwestina mûçeyekê bike destwerdana acîl dikin. Piştî destwerdanê mûçedayîn tê kirin.

## WEKU KURTASÎ EM BIBÊJIN:

- *Navendên tenduristiya civakê, navenda tenduristiya malbata, navenda tenduristiya koçberan, navenda tenduristiya zêdebûnê û tenduristiya weremê ku di nava xizmetên tenduristiyê asta yekemîn de cîh digirin, dikarin bêpere bigihêjin tedawiyê.*

- *Li navendên tenduristiyê yên malbatî di asta yekemîn de miayene, derzî, pansûman, enjeksiyon, şopandina ducaniyê tê kirin û di mijarên rêbazên kontrola jidayikbûnê (zayînê) de alîkarî tê stendin.*

- *Li navendên tenduristiya koçberan yên bihêzkirî jî, tevî ev tiştan dahiliye bo zarokan û li cem pisporên bijîşkên jinan dikarin miayene bibin, ji klînîkên tenduristiya dev û diranan jî dikarin jê sûd wergirin. Ji bilî van xizmetan tehlîlên laboratuar ên hêsan û xizmetên xuyanggirtina tipî tê dayîn.*

- *Li klînîkên tenduristiya zêdehîbûniyê; plana malbatê, hebên kontrolkirina zayînê, prezervatîf, RÎA/spîral, ji bo mehekê derzî ya kontraseptif hûn dikarin belaş bigihêjin.*

- *Komeleya Şerkirina li hemberî Weremê (VSD), ji bo koçber û penaberan sîgortaya tenduristiya nexweşan hebe yan tunebe di pêvajoya teşhîsa fîlmê pişikê û testa PPDyê belaşî tê kirin. Ger mirov bi tuberkulozê were teşhîs kirin, nexweş dikare tedawiya belaş bigire.*

Nexweşxaneyên dewletê yên li Tirkiyê; di bin xizmetên tenduristî yên asta duyemîn de ne. Penaber û koçber heke sîgortaya wan a ewlehiya civakî hebe dikarin ji beşa xizmetên acîl a van nexweşxaneyên giştî belaş sûd werbigirin, ger sîgortaya ewlehiya civakî ya kesekî tunebe beriya ku heq bê xwestin, divê pêşî destwerdana yekem bê kirin û paşê mûçe bê xwestin. Di klînîkên nexweşxaneyên dewletê de ku di asta duyemîn de ne; mirov sîgortaya wî hebe yan tunebe nexweşê ku ev xizmetê digire, piştî vê xizmeta girt heqê beşdariyê jê tê girtin. Ji bo ku meriv sûd ji ev xizmetên klînîkê bigire beriya ku biçe nexweşxaneyê divê randevû bê girtin.

Li Tirkiyê zanîngeh û nexweşxaneyên lêkolînê yên perwerdehiyê; dikevin asta sêyemîn a xizmetên tenduristiyê. Ji bo bigihêjin xizmetên sêyemîn divê ji nexweşxaneyên asta duyemîn bên sevkirin.

# RÊKEFTINÊN ZAGONÎ YÊN DERBARÊ MAFÊ TENDURISTIYA PENABERAN DE

**Makezagon Benda 56an :**
Mafê herkesî heye ku di jîngeheke tendurist û hevseng de bijî. Dewlet piştrast dike ji bo herkesî berdewamkirina jiyana bi tenduristiya laşî û derûnî, bi zêdekirina hêza mirovî û madî, bi armanca avakirina yekrêziya navendên tenduristiyê bi rêkûpêkiya xizmetdayîna ji yek destî, plan dike.

**YUKK Benda 69/6an :**
Xwediyên serîlêdanên ji bo parastina tenduristiya giştî di bin kontrola tenduristiyê tên derbaskirin.

**YUKK Benda 89/3-a :**
Dayînên prîman – Midûriyeta Giştî ya Rêveberiya Koçê; kesên ku di bin parastina navnetewî de bin bi gihîştina wan a welat şûnde tenê saleke dikarin ji xizmetên GSSyê sûd wergirin. Piştî ku sala xwe ya yekem qedandin, tenê kesên mecbûrî alîkariya taybet bin wê GSSya wan bê domandin. Ji kesên ku serî lê dabin li gor rewşa wan a aborî yan temama prîmê yan jî rêjeyeke prîmê ji wan tê girtin. Biyaniyên ku derheqê serîlêdanên wan de biryareke neyînî hatibe dayîn wê ji bin GSSyê bên derxistin. Eger bê fêmkirin ku biyaniyan tenê ji bo tedawiya tibbî serî lê dabin wê sîgortaya wan a tenduristiyê bên betalkirin.

**YUKK Benda 90/2an :**
Kesên ku serîlêdanên wan ên parastina navneteweyî nehatibin pejirandin ji bilî xizmetên tenduristiya bingehîn û perwerdehiyê, şert û mercên sûdwergirtina mafên wan dê werin sînordarkirin.

**YUKK Rêziknameya Bicihanînê benda 91/6an :** Neçûyina bajarên ku lê îkamet dikin an jî piştî ku ji cihê lê îkamet dikin, çûn; derheqê kesên ku bi binpêkirina rêzikên ku ji hêla walîtiyê ve hatine destnîşankirin de, ji bilî mafên tenduristiya bingehîn û perwerdehiyê ji aliyê sûdwergitina mafên din dibe ku sînor werin danîn.

**YUKK Rêziknameya Bicihanînê benda 106an :**
Li gor vê bendê walîtî xwediyê serîlêdanê yan jî kesên xwediyê statuya parastina navneteweyî be; derfeta stargehê, rewşa aborî ya birêkûpêk, hejmara endamên malbatê ku hewcedariyê xwedîkirinê ne, hebûna mal û milkên wan ê têbarkirin û nayebarkirin li Tirkiyê yan jî li welatê wan, li Tirkiyê yan jî li welatê xwe ji nasên xwe alîkarî digire yan nagire, ji sazîyên gel(giştî) yan ji weqf, komele û saziyên taybet alîkarî hildide yan hilnade, sîgortaya tenduristiyê heye yan tuneye, nexweşî yan jî astengiyeke heye yan tuneye, ji aliyê xisûsên din ên ku ji aliyê rêveberiyê tên dîyar kirin kesê hewceyî alîkariyê bin wê alîkariya civakî û piştgirî ya xizmetê ji wan re bê dayîn.

**YUKK Rêziknameya Bicihanînê benda 107an :**
Li gor ev bendê kesên ku xwediyên serîlêdanên parastina navneteweyî yan jî xwediyên statu be û tu ewlehiyeke wan a tenduristiyê tunebe divê nava qanûna GSSyê de cih bigirin. Di mijara destpêkirin û bidawîanîna sîgortaya wan a tenduristiyê de biryardayîn ji aliyê Saziya Ewlehiya Civakê û Miduriyeta Birêvebirina koçê tê kirin.

**5510 SSGSSK Benda 64an :**
Li gor benda (C)yê, “hemwelatiyên ji welatên biyanî; kesên xwedî sîgortaya tenduristiyê ya giştî yan jî kesên ku di bin ew kesê xwedî sîgortaya tenduristiyê ya giştî de be ji beriya dîroka hejmartinê nexweşên kronîk hebin, sazî heqê vê nade” bi vî awayî tê diyarkirin. Ji ber ev bendê kesên ku heger beriya tê kevin welêt nexweşiyên wan ên kronîk hebin di heqdayinên tedawîkirinê de pirsgirêkan dijîn.

**Rêziknameya Parastina Demkî Benda 31an :**
Di çarçoveya vê benda birêkûpêkkirina xizmetên tercumaniyê di kar û kirariyan de, dema di asta têkiliya ku tê xwestin de bi biyaniyek re bêyî wergêr nehatibe kirin, divê bêheq xizmeta tercumaniyê bê dayîn.

**Giştînameyên li ser Xizmetên Tenduristiya Acil:**
Di giştînameyên di salên 2008 û 2010an de hatine weşandin; “ li bê nihêrîna hebûn û tunebûna sîgortaya nexweşan an jî dikare an nikare heq bide wê bên qebûlkirin û bê şert û merc hewceyî çi mûdaxaleya tipî hebe divê bêderengxistin bête kirin.” ev îbare cih digire.

**Mewzûata di dema COVID-19ê de hatiye weşandin:**
Saziya Ewlehî ya Civakê di ragihandina li ser guhertina Ragihandina Pêkanîna Tenduristiyê de û biryara Serokkomar a dîroka 13/04/2020 û hejmara 2399, li bê nihêrîna hebûn û tunebûna ewlehiyeke civakî ji bo herkesî gihîştina tedawiya COVID-19ê hatiye mîsogerkirin.

# XALÊN GIRÎNG

## 1

Kesên ku serîlêdanên wan ên parastina navneteweyî yan jî statuya wan hebe û kesên ku di bin parastina demkî de bin, ji bilî bajarê lê îkamet dikin dema serîlêdanên di rewşên acîl de li nexweşxane yan jî saziyên tenduristiyê; ji ber Giştînameya Tenduristiyê ya Acîl nikarin bên vegerandin.

## 2

Penaberên neqeyidkirî dema serî li navendên tenduristiyê didin ji Giştînameya Tenduristiya Turizmê nayin hesibandin, ji ber ku ew ne turîst in. Di dema rewşeke wiha de divê ji personelên berpirsiyarê karûbarên darayî û mafên nexweşan re hevdîtin bê talepkirin!

## 3

Di benda 69an a Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyaniyan (YUKK) de û di benda 20î Rêziknameya Parastina Demkî de tê xuyakirin ku di demên “tên hesibandin ku tenduristiya gel dixin xeterê” û li ser nexweşiyên bivegirtin jî lê bê zêdekirin û dîsa bê şandin ev weku binasî naye nîşandan. Ji ber rewşeke wiha dijberî mafên mirovan e.

**Nîşe:** Agahiyên ku di vê beşê de cih digirin bi hevkariya Komeleya Piştgiriyê ya Ardiçê û Doktorên Sînornenas ve di bernameya elçiyên tenduristîyê de ji pêşkeşiyên Nurullah Cansı û Ayşin (Fatemeh) Dehghan ku di bernameyê de cih digirtin û di ronahiya agahdariyên Dr. F. Deniz Mardin dayî de hatiye amadekirin.

# PIRS-BERSIV Û TECRÛBEYÊN DERBARÊ TENDURISTIYA PENABERAN DE

**Ez jî penaber im, ji ber saleke min qediya ye niha sîgortaya min girtî ye. Lê ez hîn jî diçim hekîmê xwe yê malbatê. Tenê dema dermanan li reçeteyê dinivîsîn ku bigirim heqên dermanan didim. Ji bo her kesî ev tişt heye, yan ev rewş girêdayî însîyatîfê ye?**

- Wiha, bi rastî tiştên ku divê bê kirin, dikin. Li Tirkiyê xizmetên tenduristiyê yên ku di asta yekemîn de ne, li Navendên Tenduristiya Malbatan û Navendên Tenduristiya Koçberan belaş in. Li wan deran tu heq naye xwestin. Sîgortaya we ya tenduristiyê hebe yan tunebe hûn dikarin serî li van navendan bidin. Yek ji pirsên ku pêşî hatibû pirskirin bi vî awayî bû "serîlêdana min ya parastina navneteweyî bê redkirin ez dikarim sûd ji xizmetên tenduristiyê wergirim". Ya rastî, dikare ji xizmetên tenduristî yên bingehîn sûd wergire. Li asta yekemîn yanî li navendên tenduristiya koçberan û navendên tenduristiya malbatan de xizmetên ku tên kirin xizmetên tendirustiyên bingehîn in. Di nava ev tiştan de bi rastî xizmeta ku tê dayîn hem xizmetên klînîk û hem jî xizmetên tenduristiya parêzger e. Weku me got, ev tişt belaş in. Di vê derê de pirsgirêk tenê ev e: Mînak ez li Tirkiyê, li Stenbolê li navendeke tenduristiya malbatan de qeyitkirî me. Lê ku li bajareke din dema biçim ASMyeke din ew kes dikare ji min re bibêje "îro nexweşên min ên qeyidkirî hene. Wextê min tuneye ku ez we miayene bikim." Mafê wan heye ku wisa bibêjin. Lê dema biçim doktorê ku qeyda min li cem wî/ê ye sîgorta min hebe yan jî tunebe dikarim miayene bibim.

**Nexweşiya sendroma rûviya hêrs (îrrîtabl) bi min re heye û divê her meh birêkûpêk ez dermanan bikarbînim, lê sîgortaya min tuneye. Ji ber sîgortaya min tuneye jî bi tu awayî nikarim biçim doktor. Di vê mijarê de dikarim çi alîkariyê bigirim?**

- Eger sîgortaya ew kesî tunebe û divê li Tirkiyê birêkûpêk dermanan bi kar bîne û ew kes heger qeyidkirî be dikare bi xwastina alîkariya ji komeleyan serî li alîkariyên civakî bide. Divê veguhêzîne ku bi nexweşa kronîk re dijî û birêkûpêk divê dermanan bi kar bîne û serî li alîkariyên civakî bide. Ji bilî vê divê ew bi xwe heqê xwe bide û biçe nexweşxaneyê.

*"Beriya her tiştî divê kesek di rewşa acîl de çû nexweşxaneyê beriya ku mudaxaleya tipî were kirin astengiya pere tunebe, ev qaîdeyek e. Di rewşeke wiha de divê bi yekeya mafên nexweşan re yan jî (ALO 184) di xeta gilîkirinê de qeyda gilîkirinê bête çêkirin."*

**Ger yekî nexweş biçe nexweşxanê divê pêşî mudaxale bê kirin, zanînek li ser paşê peregirtinê agahiyek heye. Li Yalovayê tenê nexweşxaneya dewletê heye. Eger nexweş biçe servîsa acîlê û acîl qebûl neke, di vê rewşê de mafê me yê gilîkirinê heye?**

- Di vê rewşê de ger hewcedariya acîl a bersivê hebe, li her nexweşxaneyê yekeya "mafên nexweşan" heye. Lê mixabin xebatkarên vê yekeyê di mijara mafên koçberan de ne xwedî zanînekê ne. Ji bo vê yekê meriv fêrker be û ji bo parastina mafan, heyîn û zanîna giştînameyan baştir dibe. Ev jî dikeve vê mijarê ku meriv bi xwe mafê xwe biparêze. Beriya her tiştî meriv dema di rewşên acîl de çû nexweşxaneyê beriya mudaxaleya tipî ev qaîdeye ku astengiya heqxwestinê divê tunebe. Di rewşeke wiha de (ALO 184) di xeta gilîkirinê de divê qeyda gilîkirinê bê çêkirin. Ez jî weku peywirdarekî tenduristiyê, di rewşek wiha de qeyda gilîkirinê çê dikim. Di gelek rewşên wiha de em bi vê rêbazê serkeftî bûn.

*"Astengiya ziman dikare karê hekîman asteng bike."*

**Tenduristxaneyên li Kayseriyê êdî xizmetê nadin biyaniyan. Wan dişînin Navendên Tenduristiya Koçberan. Ji ber tunebûna tercûmanan û bi hinceta ku pirsgirêkan dibînin wan rasterast dişînin Navendên Tenduristiya Koçberan. Gelo mafeke wan a wisa heye?**

- Em dizanin ev pirsgirêk li bajarên cûda jî tê jiyin. Dema ku ji aliyê hiqûqî em binêrin, belê dibe tiştek wisa bê kirin. Ji ber ku kesek neqeyidkirî navendeke tenduristiya malbatî be, hekîmên malbatan dikare pêşî nexweşên xwe hilde; dikare nexweşên mêvan hilnede. Ji ber ku girtina nexweşên mêvan di înîsîyatifa hekîm de ye. Hekîmên malbatan ji nihêrîna

nexweşên qeyidkirî û tenê ji şopandina wan mesûldar in. Ji bo wê dikarin bibêjin "ew roj nexweşê min zêdebûn". Ji bo wê dikarin koçberên li cem wan qeyidkirî bin jî bişînin Navendên tenduristiya Koçberan. Astengiya ziman dikare kare hekîman asteng bike.

**Navenda Tenduristiya Koçê ya bajaran, li kîjan bajarî hene û em dikarin çawa xwe bigihêjînin navnîşanên wan?**

- Hinek Navendên Tenduristiya Koçê ya bajaran, di malperên mudiriyeta tenduristiyê ya bajaran de tên parvekirin. Mixabin, navnîşan rasterast naye dîtin. Herî dawî lîsteyek hatibû weşandin. Lê em dibînin ku di wê lîsteyê de guhertin heye û "Projeya Sihhat-2" dest pê dike. Ji ber vê yekê wê hejmara van navendan bên zêdekirin. Hinek caran sererastkirin naye kirin, beriya çûyînê divê meriv bişopîne.

**Xebatên li ser Navendên Tenduristiya Koçê yên Bihêzkirî niha çiqas belavkirî ne û nêzîkî çend heban hene?**

- Mixabin di malpera wan de li ser vê mijarê ji aliyê bajaran hejmar nehatiye dayîn, lêbelê em dizanin wê bi "Projeye Sihhat-2"yê hejmara wan zêde bibin. Meriv dikare di derheqê Navendên Tenduristiya Koçê yên Bihêzkirî de ji Mudiriyetên Navendên tenduristiya Koçê yên Bajaran agahiyan bigire. Di bin "Projeye Sihhat-2" yê de, di malpera wan a webê de ji nexşeya heyî dikare bê nihêrtin. Weku tê zanîn li Stenbolê bi giştî 9 heb hene. Lê weku em dizanin hejmar ji van zêdetir in.

> *Koçber û penaberên li Tirkiyê, derziya Covid-19yê dibin yan nabin heta demeke berê jî me nizanîbû. Em hîn bûn di wê nivîsa fermî de ya dawî hatiye, tê diyarkirin ku wan jî tevî kirine û dest bi aşîkirinê kirine.*

**Li Tirkiyê ji bo koçber û penaberan xebatên derziya Covid-19yê di çi rewşê de ne?**

- Koçber û penaberan li Tirkiyê, derziya Covid-19yê dibin yan nabin heta demeke berê jî me nizanîbû. Em hîn bûn di ew nivîsa fermî de ya dawî hatiye, tê diyarkirin wan jî tevî kirine û dest bi aşîkirinê kirine. Weku TBByê (Yekîtiya Tabîp ên Tirk) me ji Wezirxaneyê re pirsên

pêşniyaznameyan şandibû. Li ser Tirkiye meriv nikare tiştekî zelal bibêje, lê dikarim van bibêjim. Li gor agahiyên ku stendine bi taybetî jî yên di kotaya tendurîstkaran de cih digirin, derzîya xebatkarên tenduristiyê yên koçber û penaber hatiye kirin; li bajarên biçûk ev aşîkirin birêkûpêk tê kirin, lê em dibihîsin ku li bajarên mezin hîn xebatkarên tenduristiyê yên koçber û penaber ên neaşîkirî hene. Ji bilî van tiştan koçber û penaber jî ketin nav komên temenan. Lêbelê heta niha derbarê çend kes hatiye aşîkirin de tu agahî tuneye.

**Ku kesek ji koçber û penaberan xwedî sîgortaya taybet be û nexweşiya basûrê pê re hebe her gav xwîn jê were. Divê ev kes mudaxele lê bê kirin û ameliyat bibe. Di vê rewşê de jî divê heq bide?**

- Ger xwînhatina aktîf hebe, xwîn hebe ku jiyana mirov têxe xeterê, divê acîl bigirin ameliyatê. Lê ger ne rewşeke acîl be, yanî ji ber xwînhatinê bandor li ser tenduristiyê neke, yanî ne rewşeke wiha acîl de be, pêşî pêvajoya klînîkê û hin astên hûrnêrînan divê derbas bibe. Ger di vê rewşê de be, ne rewşeke acîl a tenduristîyê ye. Lê acîl be jî ne acîl be jî eger sîgorta tunebe divê heqeke bide.

**Li gorî van tiştên di vê derê de hatine vegotin, dibêjim tevahî mesele di bin înîsiyatîfa saziyên xîzmetên tenduristiyê de ne. Rast fêm dikim? Biryara acîlbûn û ne acîlbûna tiştekî navendên tenduristiyê didin. Weku mînak diranê min diêşin, ev ne rewşeke acîl e. Lê dema destê min şikiya ev rewşeke acîl e. Rast fêm dikim?**

- Em dikarin bibêjin ji bo vê rewşê tenduristkar biryarê didin. Tabî ev jî krîtereke wê heye. Wisa ku; weku kategorizekirina diyarkirina rewşên metirsiya jiyana we. Weku mînak, pirsgirêka diranan rewşeke pir bi êş e, lê metirsiya jiyanê nîşan nade. Ji ber vê yekê hûn dikarin biçin acîlê. Lê ev rewşeke wisa ye ku hûn dikarin roja din biçin klînîkê jî. Lê hûn dilrawestinê derbas bikin ev ne rewşeke wiha ye. Yan jî derbaskirina xwînrêjiya mejî jî ne rewşeke wiha ye. Yan jî şikeştineke hebe, weku mînak ger ev bibe sedema xwînrêjiya hundurîn ev nabe rewşeke wiha. Ji ber vê yekê ji aliyê tenduristiyê yên ku em ji wan re dibêjin acîl weku “koda sor” yan jî “koda zer” ev jî astên acîlan tê de hene. Weku mînak çewa nexweşiya epîlepsiyê ne metirseyeke jiyanî ye; lê dema derbaskirina epîlepsiyê ketin û serê xwe li cihekî dan, ev dibe sedema îxtîmala metirsiya xwinrijiya mejî. Divê bijîşkek ji berê de vê rewşê bibîne û we di bin çavderiyê de bihêle. Beşeke pêşdîtinê jî tê da heye. Eger niha xwinrijî nebibe jî fikirîna îxtîmala belkî bibe heye.

> *Peymanên navneteweyî ku Tirkiyê jî destnîşan kiriye, ji ev an yek jî CEDAW e, di dema serdema lohusaya dayîkan, parastina hewcedariya garantîkirina gihîştina xizmetên tenduristiyê dikin.*

**Hate gotin ku di dema rewşên acîl de ji sîgortaya tenduristiyê ya giştî meriv dikare sûd jê wergire. Lê weku mînak aniha jineke ducanî heye û serîlêdana wê ya parastina navneteweyî nehatiye pejirandin. Ev jin nikare ji sîgortaya tenduristiyê ya giştî sûdwergire. Ji bo vê meriv dikare çi bike?**

- Di vê navberê de, yek ji pirsgirêkên bi vê yekê ve girêdayî ye ku zayîn(jidayîkbûn) weku bûyereke acîl nayê dîtin. Ev di mewzûatê de jî wisa ye. Ev weku bûyereke siruştî û dema weku rewşeke siruştî tê dîtin yek ji pirsgirêkeka tenduristiyê napejirînin. Bi giştî li acîlê di dema aktîvasyonkirina sîgortaya tenduristiyê de di girtina xîzmeta belaş de pirsgirêk derdikevin. Weku din, ez dikarim vê bibêjim. Mixabin ew kesên sîgortaya wan hene dema li bajarê îkametên wan lê ne namînin û li bajareke din dijîn dema diçin serî li servîsên acîlê din didin ji wan tamheq tê xwestin, yanî weku bê sîgorta bin ji wan heq digirin.  Lewma weku min got jidayîkbûn weku bûyereke acîl naye pejirandin. Lê di şert û mercên xuya de pêdiviya mudaxaleya acîl tê pejirandin. Ji vana yek jî dema rewşeke metirsiya jiyana dayikê hebe; ya din jî ger rewşeke metirsiya jiyana pitikê hebe. Ji bilî ev tiştan ji ber ku jidayikbûn weku rewşeke acîl naye dîtin mixabin bi giştî aktîvasyona sîgortayê jî weku acîl nabîne. Di dawiyê de, li ser bingeha peymanên navneteweyî ku Tirkiyê jî destnîşan kiriye, ji ev an yek jî CEDAW e, di dema serdema lohusaya dayîkan, parastina hewcedariya garantîkirina gihîştina xizmetên tenduristiyê dikin. Turkiye jî destnîşan kiriye. Lêbelê mixabin pirsgirêk derdikevin. Ger parêzvanî bê kirin divê di rewşeke wisa de jî li ser vê peymanê bê kirin.

- Rewşa ducaniyê ji bo vekirina SGKyê weke rewşeke mecbûrî naye pejirandin. Mudaxaleyên acîl dikarin bên kirin, tenê kontrolên rûtin naye kirin. Di dema jidayîkbûnê de, zayîn dest pê kiribe ketina acîl a nexweşxaneyan dibe. Hinek nexweşxane dikarin zordariyê derxînin, lê dîsa jî ji ber ku zayîn dest pê kiriye divê ew kes were qebûlkirin. Helbet

paşê wê heqek bê xwestin. Bi giştî di wê dema heqxwastinê de pirsgirêk dernaxînin. Lê carinan piştî mudaxaleyê ji bo destnîşankirina senedê dixin zorê. Carinan, di hin rewşên nelirê de rewş digihêje heta destbiserkirina zorak jî. Lê ji vana yek jî ne zagonî ne. Bi gilîkirin û parêzvaniya ji Wezareta Tenduristiyê û Mudiriyeta Tenduristiya Bajaran ev rewş tên çareserkirin. Ji ber vê yekê, ji bo di dema jidayîkbûnê de bi bûyerên wisa rûbirû nemînin û pirsgirêkên tenduristiyê nejîn, divê bêtirs bikarîbe biçe nexweşxaneyan.

> *Rewşa ducaniyê ji bo vekirina SGKyê weke rewşeke mecbûrî naye pejirandin.”*

**Piştî ji Rêveberiya Koçê biryara “redkirinê” girt, li Rêveberiya Koçê hate gotin ku wê sîgorta bê aktîfkirin. Ji kerema xwe re hûn dikarin ev mijarê berfirehtir vebêjin?**

- Di vê derê de dixwazim pirseke bikim. Dema behsa nepejirandin û ji rewşa redkirinê tê kirin qesta redkirina serîlêdanên me yên parastina navneteweyî tê kirin? Yan jî qesta piştî ku em li Tirkiyê sala yekem xilas dikin, redkirina xwastina dirêjkirina peydakirina sîgortaya tenduristiyê tê kirin?

- Ji bo kesekî ku serîlêdana we/î ya parastina navneteweyî hatiye redkirin dixwazim ev tiştî hîn bibim.

- Me behsa mafê tenduristiyê ku ji mafê me ya bingehîn e kiribû. Mudaxaleyên rewşa acîl mijareke hergav em li ser disekinin. Di qanûnan de tê gotin ku di rewşên acîl de ti kes naye vegerandin. Heta di vê derê de tê gotin redkirina serîlêdanên parastinê bên kirin jî dikare li nexweşxaneyan miayene bibin, di xizmetên acîl de divê ku hewceye tu beşek pere bidî lê ev kesê ku serîlêdanê kiriye ji bin “turîzma tenduristiyê” nikarin bihesibînin.

- Di qanûnê de dibêje ”pêşkeşiya xizmetên bingehîn tên kirin”. Lê ji ber ku ev nehatiye berfireh kirin û kesên ku biryarê didin ne tendurîstkar in di nava bajaran de em cûdahiyan dibînin. Xizmetên bingehîn, divê bi taybetî xizmetên asta yekemîn (bi taybetî xizmetên parastinê) derziyên

pitikan, şopandina jinên ducanî yan jî xizmetên acîl bigire nava xwe. Lêbelê em dibînin bajar bi bajar ev cûdahî hene. Û îja ji dema betalkirina sîgortayê şûn de, mixabin li gelek bajaran tevî xizmetên acîl jî em dizanin penaber tên red kirin. Lêbelê mafek heye, lê pêkanîna wan jî heye. Mixabin cûdahî bajar bi bajar, nexweşxane bi nexweşxane diguhere.

- Li ser vê mijarê hevalên din ên ku wiha diyar kirine rast in. Ji ber pêkanîna yasayan valahiyek û nediyariyek heye. Derbarê bendên xizmetên perwerdehî û tenduristiyê de ku di mewzûatê de cih digirin, Tirkiye di wateya giştî ya mafên ku ji bo parastina peymanên navneteweyî hatine peywirdarkirin de nîşeyeke daniye. Lê di pêkanînê de bi xizmetên tenduristi yên acîl tê nirxandin. Ji ber ku dema rewşeke li ser mafê jiyana kesekî bibe, dewlet mecbûr e vê yekê biparêze. Ji bo wê dema kesek biçe servîsa acîlê bi nasname an bê nasname dema rewşeke acîl hebe nexweşxane mecbûr e ev kesî hilde.

- Bi gelemperî ji bo kesekî derbarê serîlêdana parastina navneteweyî de ku biryara nepejirandinê derketî be dikare îtiraz bike. Piştî ku serî lê da ji bo îtirazê, ger raporeke derbarê rewşa tenduristiya ew kesî de hebe, weku niha hate gotin di înîsiyatîfa Rêveberiya Koçê ya Bajaran de ye dema bixwazin dikarin sîgortayê aktîf bikin. Ji ber ku bi gelemperî dema biryara nepejirandinê derdikeve nasnameya Parastina Demkî ji we tê sitendin. Paşê hûn îtiraz dikin. Bi ewraqa fermî ya we pê îtiraz kiriye hûn diçin ji bo nasnameyê serî lê didin. Dema we ev nasnameyê hilda bi rapora tenduristiyê ya di destê we de ye hûn diçin îbraz dikin. Piştî ku we ev îbraz kir, sîgortaya tenduristiyê ya hin kesan vedikin, yên hin kesan jî qet venakin. Ev bi temamî girêdayî înîsiyatîfa wan e. weku mînak, ez li Yalovayê dijîm, li ev derê wisa dibe. Pistî ku sîgortaya tenduristiyê vedikin heta biryara di derbarê Serîlêdana Parastina Navneteweyî de bê dayîn dikarin ji mafê sîgortayê sûd wergirin. Dixwazim rewşeke wiha jî lê zêde bikim. Bi gelemperî mafê sîgortayê salek e, di rewşên redkirinê de nasnameyê bi demkî ji bo du mehan didin û mafê sîgortayê jî du mehan vedikin. Dema ku biryar hemen neye dayîn hem dikarî nasnameya xwe nû bike hem jî ji nû ve mafê dirêjkirina sîgortaya tenduristiyê çêdibe. Tabî van tiştên me behs kirin hin jê girêdayî înîsiyatîfa wan in.

**Ji penaberên ku bi nexweşiya HIVê re dijîn di mijara gihîştina dermanan de gelek kes serî li me didin. Di vê rewşê de divê meriv rêyeke çewa bimeşîne? Klînêkên enfeksiyonê tenê nexweşên Covid-19yê digirin. Di vê rewşê de divê çi bê kirin?**

- Rewşa ku yekem hat behs kirin, belê pirsgirêkeke mezin e. Ji ber bihabûna maliyeta tedawîkirina hem HIVê û hem jî Hepatît C yê, ger ev rewş beriya ku were welat tunebe, yanî li welat hûn bi rewşeke wisa hesiyabin wê demê ji aliyê sîgortayê tê dayîn. Lê ger beriya ku hûn werin Tirkiyê nexweşiyek bi we re hebe ev bi temamî li derveyî sîgortayê tê hesibandin. Ev jî bi temamî di pêvajoya gihîştina tedawiyê de her tiştî dike bi peran. Kesekî ku nexweşiya tuberkulozê pê re hebe qeyidkirî be an ne qeyidkirî be, sîgortaya tenduristiyê hebe an tunebe divê tedawiya bêpere û dermankirina li nexweşxaneyê bigire. Li komeleya ez lê dixebitim keseke me şewirmendiya wî/ê dikir hebû. Bi ew kesî hem nexweşiya tuberkulozê hebû û hem jî bi nexweşiya HIVê re dijiya. Dermankirina tedawiya tuberkulozê li nexweşxanê, bêpere me da kirin. Lê ji bo tedawiya HIVê me nikarîbû tiştak jî bikira. Em dizanin teşhîs zêde bûne. Em dizanin di ev mijarê de ji aliyê wezareta tenduristiyê ve civîn hatine dest pê kirin. Di van çend salên dawîn de hem hemwelatiyên Tirkiyeyê û hem jî di navbera koçber û penaberan de hejmar zêde dibin. Lê mixabin SGK di heqdayînê de zordariyan derdixîne. Ger rewşeke hewcedariya alîkariya hiqûqî hebe divê ew kes teqez serî li alîkariya hiqûqî bide. Ev girîng e ji bo parastina mafê xwe. Vê rewşa ku me behsa wê kir, ji bilî wê ji bo nexweşên penceşêriyê jî derbas dibe. Hebûn û tunebûna teşhîsê beriya were Tirkiyê û li gor di teşhîskirina li welat de cûdahî çê dibin. Di mewzûata wezaretxaneyê de tişteke wisa heye û ev rewş destê me jî girê dide.

**Kesê beriya were welat an li welat, çewa tê tespîtkirin ku enfekte ye? Mînak, dibe ku rewşeke wisa hebe; ew ferd beriya ku bê welat ne enfekte ye û li welat enfekte bûye. SGK ji bo bi bihayên zêde heq nede dikare bibêje beriya were welat enfekte bûye. Di ev rewşê de meriv dikare çi bike?**

- Tehlîla ku we di demeke kin de kiriye ji bo we AVANTAJEKE mezin e. Ger ji aliyê tipî hûn bi HIVê re dijîn, nirxa xwîna we hêdî hêdî dikeve. Ger nirxên xwinê dest bi ketinê kiribin, ev bi HIVê re piştî enfektekirinê ji ber pêvajoyeke hêdî hêdî û bi ast e, ev rewş destê we xurt dike. Piştrastkirina wê dijwar e, lê di rewşên wiha de li ser komeleyan girtina alîkariya hiqûqî û kirina parêzvaniyê girîng e.

**Hinek derzî hene ku pêşî li enfeksiyonên zayendî digirin. Mînak derziya Hepatît Byê ji bo hinek kesan belaş tê kirin. Weku mînak, ji ber nasnameya xwe ya trans di koma xeternak de bûm ez belaş bûm. Lê bi gelemperî ji bo ev derziyê heqek tê xwastin. Gelo niza jinên trans ên penaber jî di nav ev rewşê de ne?**

- Derziya Hepatît Byê weku "derziya kesên gihîştî" tê zanîn ji ber ev yekê divê her kes bikarîbe bigihêjê. Derziyeke ku di asta yekemîn de tê kirin. Mudaxeleyên ku di asta yekemîn de tê kirin belaş in ji ber vê yekê di şert û mercên gelemperî de divê bê gihîştin. Yanî, belê penaber jî dikarin ev derziya Hepatît Byê belaş bibin.

**VEGUHESTIN:**

*Pêşniyara min ew e ku bila her kes li navendên tenduristiya malbatan, bi belaşî derziya Hepatît-Byê bibin. Derziya Hepatît-Ayê di dema zaroktiyê de bi belaşî weku mecbûrî tê kirin. Derziya Hepatît-Cyê tuneye, dermanên wê hene lê mixabin pir biha ne.*

**(Hişyariya Naverokê ya Teqekirinê: Tundiya Zayendî): Di bûyerên tundiya zayendî de ji ber tunebûna maseya krîzê ya destavêtinê, kesê/a di prosedurê de serîlêdanê kiribe yanî ew kesên ku mexdûrê tundiya zayendî ne, ger zayenda nîşankirî jin be û beyana wê jî jin be, piştî tundî ya zayendî ji bo bidawîanîna ducanîtî ya nexwastî hin prosedur têne kirin. Li hemberî enfeksiyoneke muxtemel tedawiya PrEP û PEPê tê kirin. Ev tişt ji bo jinên penaber jî derbas dibin? Ji bilî van tiştan ya ne jina cîs be, penabereke mêr ku zayenda wî ya nîşankirî mêr e dema li hemberî tundî ya zayendî rû bi rû ma û çû nexweşxaneyê prosedureke çawa tê kirin?**

- Helbet ji bo penaberan jî ev rewş derbas dibe. Bi taybetî tacîz û tundiyên zayendî bûyerên edlî ne jî. Van rewşan ne bi heqdayîneke, divê bi belaşî xizmet bê kirin. Bêguman, dema ku em dinêrin ka ev rewş di pratîkê de çawa çêdibe, mixabin em dibînin ku gelek nexweşxaneyan li ser vê mijarê têra xwe agahî tuneye. Ji aliyê mudaxaleya yekem hem astengkirina ducaniyê û hem jî astengkirina nexweşiyên şewbê wê cûdahiya jin-mêr nebe; ji ber ku ev rewşeke edlî ye. Mixabin li nexweşxaneyan ji bo mudaxaleya yekem em tiştên wisa (pêşî biçin dadgehê) jî dibihîsin. Mixabin nizanin ku divê pêşî mudaxale bê kirin. Lê dema ku em ji aliyê mafî lê binêrin, penaber jî bêcûdahiya jin-mêr xwediyên heman mafî ne.

**Li Tirkiyê, divê sîgortaya wan, ew kesên ku bikevin pêvajoya guncanî ya zayendê hebe. Bi taybetî jî di pêvajoya psîkiyatrîstiyê de ku hevdîtinên her meh tên kirin, divê SGKyan weku karta şîn an jî sîgortayeke we ya tenduristiyê ya şexsî yan malbatî hebe. Ger tunebe divê hûn heqê psîkiyatrîst ku di navbera 6-12 mehan dewam dike, bidin. Lê ji bo kesên ne Tirkiyeyî ne rewş çawa ye? Hin ji yên operasyonên adaptasyona zayendî (weku jinên trans ku pêsîran çê dikin, ji bo mêrên trans jî weku mastektomî) ji bo kesên hemwelatiyên Tirkiyê bi belaşî tê dayîn. Ji bo transên penaber cûda ye, yan jî prosedurek weku ya hemwelatiyên Komara Tirkiyê tê meşandin?**

- Nasnameya penaberan ku bi hejmara "99"an dest pê dike ger hebe û li bajarê lê destûra rûniştinê dabin li ew derê îkamet bike di şert û mercên heyî de şertên gihîştina xizmetan hemen hemen weku yên hemwelatiyên T.Cyê ne. Lêbelê di pirsgirêkên pratîkî de dibe cûdahî derkeve.

# VEGUHESTINA PÊVAJOYA GUNCANÎ YA DERBARÊ ZAYENDÊ DE

Pêvajoya Guncanî ya Zayendê, derheqê kesên trans de, di her qadan de tiştên ku jiyan e şexsî, hiqûqî, civakî, polîtîk tê de hatiye vegotin. Hin guherînên ku kesên trans li ser nasnameyên xwe kirine, dibê ku perçeyeke ji pêvajoya guncandina zayendî be. Ji bilî navê hatine dayîn xwestina bikaranîna naveke yan cînaveke, li gor nasnameya zayendî lixwekirina cil û bergên cûda, guhertina nav an jî zayendê li ser dokumentên zagonî, bikaranîna hormonan û weku heyîna hin operesyonên di pêvajoya guncandin a zayendî perçeyeke ji rewşa pêvajoya guncandinê ye. Ferd di pêvajoya guncandinê de xwestina kirina ev an hemiyan yan yekî yan jî çend heban dikare bixwaze yan jî bike.

Penaberên li Tirkiyê dijîn weku her hemwelatiyên Tirkiyê xwedî mafê birêvebirina pêvajoya guncandina zayendî ne. Ji bo ev yekê divê penaber li Tirkiyê xwedîrûniştina zagonî bin. Di nebûna ev tiştan de meriv dikare bi pasaportê û dokumenteke fermî ku mayina zagonî ya li Tirkiyê nîşan bide û pêvajoyê bide destpêkirin. Di ber van tiştan de şerteke temen jî heye, divê ew mirov 18 saliya xwe tije kiribe û divê ne zewicandî be. Yanî divê ew mirov an bekar be yan jî veqetiya be.

Ji bo ferd weku fermî dest bi pêvajoya guncandin a transî bike, divê doza destûra guncandin a transî veke. Piştî ku serî li vê destûrê da, ew kes ji aliyê dadgehê ve dişînin nexweşxaneyeke ku lê "konseya nasnameya zayendê" hebe. Piştî ku çû nexweşxaneyê pêvajoya çavdêriya psîkiyatrîk dest pê dike. Pêvajoya çavdêriya psîkiyatrîk bi gelemperî di navbera 6 meh û 2 salan de didome. Piştî vê pêvajoyê ji bo bikaranîna hormonan wan dişînin Endokrînolojîyê.

Piştî qedandina pêvajoya çavdêrî û nirxandinê, ji bo ew kesî weku fermî raporeke tenduristiyê tê dayîn. Ev raporê dibin dadgehê. Dadgeh vê raporê kontrol dike û ji bo destûra guhertina zayendê ji dadgehê biryarek tê sitendin.

Niha jî dixwazim di van astan de behsa dijwariyên ku penaber dijîn vebêjim. Pêşî dema diçin dadgehê ji bo dozvekirinê, astengiya ziman derdike holê. Bêyî tercuman pêvajo bêhtir dirêj dibe û dijwarî derdikevin. Duyemîn jî di dema berdewamkirina vê pêvajoyê de wan dişînin nexweşxaneyên

perwerdehî û vekolînê yên bajarên mezin. Ji ber çûyin û hatina bajarên mezin, mesrefên rê û cihmayînê jî çêdibin û bi tu awayî ev mesref nayin dayîn. Min behs kiribû di dema destpêkirina pêvajoya çavdêriya psîkiyatrîkî de ku di navbera 6 meh-2 salan de dewam dikin jî astengiya ziman û pirsgirêkên turcuman derdikevin. Pîştî dema em dest bi terapiya hormonî dikin jî, mixabin mesrefên dermanên hormonan jî nayin dayîn. Em bibêjin me ev an jî derbas kir, ji ber bêtecrûbeya xebatkarên dadgehê meriv pergî kiryarên nexweş tê û mixabin li gelek dadgehan biryar erênî nabe. Û ev rewş jî di înîsiyatîfa wan de dimeşe, em nikarin têkevin nav lêgerîneke mafî.

Dema em pêrgî van pirsgirêkan tên aktîvîst û parêzerên komeleyan – weku HÊVÎ - ku li ser van mijaran zane ne, em alîkariya hiqûqî dikarin ji wan bistînin. Heta em ji hin komeleyan ji bo mesrefên dermanên hormonî alîkarî distînin.

Em bibêjin heta ev derê her tişt temam bû. Biryar jî derket, operasyonên guncandina zayendî jî hatin kirin. Mixabin ev operasyon jî pir bi mesref dibin. Li gor agahiya ku min herî dawî hilda ji bo jinên trans, li nexweşxaneyên dewletê nêzîkî 15.000 TL mesref çêdibe. Li nexweşxaneyên taybet jî di navbera 40.000-60.000 TL mesref dibe. Ji bo jinên trans operasyonên pêsîran ne li ser van mesrefan in. Divê ji bo operasyonên pêsîran mesrefeke cûda bê derxistin. Piştî van operasyonan divê ji bo operasyona guherîna zayendê û ji ber guhertina zayendê li qeydên nifûsê guhertina îbareya zayendê doz bê vekirin. Piştî biryara pejirandinê guhertina îbareyê û nav tê kirin.

Yek ji pirsê ku herî zêde tê pirsîn jî divê kengî dest bi tedawîkirina hormonî bê kirin e. Ez dixwazim ev tiştî bibêjim divê bê çavdêriya doktor tedawiya hormonî neye destpêkirin. Bikaranîna hormonan di pêvajoya guncandina transî de yek ji asteke girîng e. Divê ev tişt bê zanîn, forma bikaranîn û dozaja hormonan li gor avahiya laşî dibe ku cûdahî çê bibin. Ji ber ev cûdahiyê bê rahiştina alîkariya endokrînê, divê dest bi bikaranîna hormonan neye kirin. Ji bilî van tiştan guh nedin gotinên weku "hormona Îranê baştir e, erzantir e" û piştgiriyê hildin. Fikreke wisa jî heye, tê gotin em çiqas hormonê bikarbînin ewqas zû pêvajoya guncandinê jî wê bibe; lêbelê ev jî ne agahiyeke rast e. Bikaranîna hormanan a herî rast bi rêveberiya doktor û bikaranîna birêkûpêk tê kirin.

Di dawî de ez dixwazim agahiyeke wisa jî bidim: Ji aliyê Rêxistina Bilind a Penaberan a Neteweyên Yekbûyî ji bo transên penaber û înterseksan mehê 750 TL alîkariya maddî dike.

# PIRS-BERSIV Û TECRÛBEYÊN PÊVAJOYA GUNCANÎ YA DERBARÊ ZAYENDÊ DE

**Li tirkiyê mafên transeksualan çi ne? Di pêvajoya guncanî ya transan de, ji aliyên komelayên Tirkiyê çi alîkarî pêk tên?**

- Li Tirkiyê mafê transan, pêvajoya guncanî ya transan a zagonî ji aliyê benda 40an ya qanûna medenî, ne qedexe ye. Li beramberî hin şert û mercan piştgirtiya wan tên kirin; cûdahiyeke weke penaber-koçber an jî hemwelatiyê Tirkiyê tune ye. Lêbelê helbet ev ne tam piştgirtiyeke, di pratîkê de hin pirsgirêk hene. Trans ne di ewlehiyê de ne, dema em li bendên pêvajoya guncanî ya zayendî jî dinêrin di nava şertên ji me tên xwestin de jî gelek binpêkirinên mafan hene. Li Tirkiyê trans penaber-koçber bin an nebin, di gihîştina mafên xwe yên jiyanê yê bingehîn de heman serboriyan dijîn. Ji vê ya herî girîng di xalên gihîştina mafê tenduristî û gihîştina hiqûqê de xwediyê cihekî dezavantaj in û di gihîştina van mafên xwe de rastî gelek tengasiyan tên. Ji aliyekî ve tevgera transan li Tirkiyê tevgereke bihêz e. Aktîvîzma transan, piştevaniya transan, di nav xwe de heye. Ji vî alî ve têkîlîdanîna bi van kesan re, bi rêxistinan re, yan jî bi aktîvîstan re di xala gihîştina mafan de hin destkeftî, ji aliyê belavkirina dozên emsal ve bihêz e. Di lêkolîneke de ku di 2017an an jî di 2018an de li ewrûpayê hatiye kirin ku di qetlên nefretî yên transan de Tirkiye di rêza yekem de cih girtiye. Di heman demê de, li gor gelek welatên Ewrûpayê Tirkiye ji bo transan wek welatekî ewle tê nîşandan. Û kesên îltîca kirine ku dema rêya wan di Tirkiyê de derbasbûne, hin welatên Ewrûpayê wisa dibêjin ku Tirkiye ji bo transan welatekî ewle ye. NY her meh ji bo trans û înterseksuelan 750 TL alîkarî dide. Piştî hatina penaber û koçberan a welat alîkariya sîgortayê ku salekî dikarin jê sûdwergirin çêdibe û heger di nava salekê de ger pêvajoya guncanî ya transî hatibe destpêkirin, rapora ji bo destûrê pêwist e jî ku dikarin vê hildin û bi awayekî bêpere mûayeneyên xwe bikin. Rewşeke wisa heye: kesên ku saleke wan temam bûne, mesrefên wan ên rê û pereyê muayeneyên wan ji bo carekê, tenê ji aliyê hin komeleyan ve tên dayîn. Bi vî awayî rapora xwe digirin û dikarin bên sîgortaya xwe vekin.

**Ez dixwazim wek transgender dest bi terapiya hormonan bikim. Di cihê acîl de, di nav wan dermanên we bahs kir, ku bêpere ne dermanên hormonan jî hene? Mînak ez biçim servîsa acîlê, dikarim dermanê xwe yê hormonan ji wir bigirim?**

- Niha servîsa acîl di rewşên wiha de, xizmeteke wisa nade. Ji ber ku servîsa em jê re dibêjin acîl tenê dikare mudaxaleya rewşên acîl bike.

**Em dikarin çawa bigihêjin hormonan?**

- Ev tiştekî wiha ye ku hem bi endokrînologan (doktoreke di qada hormonan de pispor e) û hem jî bi şopandina pisporên beşên cûda ve dikare bê gihîştin.

**Ez Sûriyeyî me û nasnameya min a penaberiyê heye. Ez dixwazim di demeke herî nêzîk de dest bi tedawîya hormonan bikim. Divê ez ji ku dest pê bikim û li kîjan bajarî destpêkirina min hêsantir dibe? Li Hatayê yan jî li Ispartayê?**

- Nasnameya te ya penaberiyê li kîjan bajarê be, divê tu li wî bajarî dest bi tedawiya hormonan bike. Piştî te li dadgeha wî bajarî ku nasnameya te lê qeyidkirî ye û te lê doza xwe kir, tu yê sewqî nexweşxaneyê bibe ku ji aliyê dadgehê ve hatiye diyarkirin û wiha dest bi destpêkirina pêvajoya tedawiyê tê kirin. Piştî derbaskirina pêvajoyeke 5-6 mehî ya derûnî-psikiyatrîk, destpêkirina tedawiya hormonan dê baştir bibe. Pêvajoya tedawiya di bin kontrola psîkiyatriyê nebe dibe ku bandorên neyînî çêbike, ji aliyê giyanî û fîzîkî ve. Tecrûbeyeke min a wiha jî heye, piştî destpêkirina hormonan demeke dirêj bikaranîna hormonan ne rast e. Ji ber vê yekê pilana operasyona xwe bikin û li gor wê tedawiya hormonan bigirin rasttir dibe.

**Ji bo pejirandina operasyonan pêvajoya transî ya şertên heyî hene, yan tune ne?**

- Belê helbet şert hene. Weku yekem divê wî/wê 18 saliya xwe tije kiribe û ne zewicandî be. Divê pêvajoya psîkolog û psîkiyatriyê bi dawî anîbe, ji bilî vana divê dest bi tedawiya hormonî kiribe û qedandibe. Divê konsey pejirandibe, piştî ji dadgehê jî destûr(pejirandin) hatibe dayîn ku pejirandina operasyonê bûye. Girtina pejirandinê ne dijwar e, lê dibe ku pêvajo dirêj û dijwar be.

**Ger transekî mêr bixwaze operasyona pêsîran bibe, ji bo vê terapiya hormonan pêwîst e, yan dikare bê terapî emeliyat bibe?**

- Ji bo transên mêr bikarîbin operasyona hildana pêsîran bibin divê di pêvajoya derbasbûna zayendî de bin, di pêvajoya tedawiya hormonan de bin û divê ji bo mastektomî jî ji hin cihên pêwîst destûrê bistînin.

**VEGUHASTIN:**

*Ez transekî mêr im û piştî lêkolîna ku min ji bo operasyona hildana pêsîran kiribû, ez têgihîştim ku nexweşxaneyên dewletê van operasyonan nakin û mirov dişînin nexweşxaneyên taybet. Beralîkirinên bajarên mezin pêk tên. Ji bo operasyona hildana pêsîran jî nêzîk 13.000 TL mesrefek çêdibe. Min ji dadgehê destûra operasyonê girt û beriya operasyonê tehlîlên ku pêwîst in min kir lê ti mesrefên min nayin ditîn.*

**Ez jineke trans im û zewicandî me, zarokên min jî hene. Ez ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve li welat wek penaber hatim pejirandin. Min xwest ku bikevim pêvajoya guncanî ya transî, lêbelê ji ber ku ez zewicandî me ev daxwaza min hate redkirin. Ez çûm Rêveberiya Koçê ya Bajêr, bi min re eleqedar nebûn. Serîlêdana min a pararastina navneteweyî hate redkirin. Beriya 7 mehan min îtîraza xwe da dadgehê û hîn jî tu encamek tuneye. Nasnameya min jî heye 2-3 hefte berê min nasnameya xwe jî nû kir, lê li saziyên fermî nasnameya min naye xuyakirin. Dixwazim piştgiriya psîkolog hildim, tedawiya hormonan jî dixwazim bibînim. Di vê pêvajoyê de alîkariya hiqûqî dixwazim. Divê ez çi bikim?**

- Ger nasnameya we ya bi hejmara "99" tune be dibe ku hûn di vekirina dozê de astengiyan bibînin. Hinek dadgeh ji bo vekirina dozê, nasnameyên ku bi hejmara "99"an dêst pê dikin, dixwazin. Lêbelê ji ber ku we doz li dijî nepejirandina serîlêdana parastinê ya navneteweyî vekiriye, weku zagonî hûn dikarin li Tirkiyê bimînin. Ji bilî vê ji bo destpêkirina pêvajoya guncanî ya transî divê doza cihêbûnê ya zewicandinê were vekirin. Ji beriya vekirina doza cihêbûnê heger serî li doza vekirina destûrgirtinê bidin, ew ê biryara redkirinê were dayîn. Bi doza cihêbûnê parêzerek dikare wekaletnameyê derxîne. Hinek noter jî bi pasaportê dikarin wekaletnameyê derxînin. Lêbelê dema we serî li yekeyên alîkariya edlî da ji bo bêpere xwastina tayîna parêzerekî jî dibe ku pirsgirêk derkevin. Hinek baro nasnameya ku bi "99"an dest pê dike tunebe jî dikare parêzer tayîn bikin, hinek baro jî tayînên parêzeran nakin.

*Min got fikra întîxarê (xwekuştinê) bi min re heye, bersiva ku min hilda jî ev bû "tu dizanî.*

**Ez li Tirkiyê dijîm. Ji Lubnanê hatim, hevzayendî me. Li cihê ez lê dijîm nasnameya zayendî û dîn xetên sor in. Ne dikarî dînê xwe biguherînî ne jî zayenda xwe. Ji ber nasnameya xwe ez ji welatê xwe reviyam hatim Tirkiyê û dixwazim derbasî welatekî din ê sêyem bibim. Dixwazim bi jiyaneke azad, weku xwe bi dilê xwe bijîm. Ji bo derbasî welatekî din bibim alîkariyê dixwazim. Li Tirkiyê ji aliyê derûnî ve pirsgirêkan dijîm. Ez li NYyê geriyam û min rewşê vegêra, min behsa pirsgirêkên ku ez dijîm kirin û min got fikra întîxarê (xwekuştinê) bi min re heye, bersiva ku min hilda jî ev bû "tu dizanî". Dixwazim di vê mijarê de alîkariyê bigirim, divê ez çi bikim?**

- Em li ku derê cihanê bin jî nasnameya me ya LGBTİ+ gelek pirsgirêkan bi xwe re tîne. Di vê mijarê de beriya her tiştî tu ne tenê yî, xwe bi tenê hîs neke. Ji bo vê tu dikarî bi me re bikevî têkîliyê, dikarî bi komeleyên din re jî têkîliyê deynî. Tu dikarî daxwaza derbasbûna welatekî bike. Lêbelê ji ber pandemiyê, ji bo derbasbûna welatekî sêyem gelek zehmetî hene, pêvajo gelek dirêj bû. Hevalên ku 7 sal e li bendî sekinî ne, hene. Bicîhkirina welatên sêyem berê di bin destê UNHCRyê de dihate kirin. Lê niha bi Rêveberiya Koçê ve hate girêdan û pêvajo pir dirêj dibe. Mixabin ji ber Covîd-19ê derbasbûna welatên din heta saleke hate dirêjkirin.

**Ez 5 sal e li Tirkiyê me. Di vê pêvajoyê de, min pêvajoya guncanî ya transî li vê derê domand. We jî diyar kir ku di heman wextê de hûn jî li vir û di nava pêvajoyê de bûne. Gelo we biryara dadgehê stend?**

- Mixabin ji ber COVİD-19ê nexweşxaneyên lêkolîn û perwerdehiyê bûne wek nexweşxaneyên pandemiyê, pêvajo hatiye asta sekinandinê, di ser de ji ber pandemiyê ez nikarim ji psîkiyatriyê xwe randevûyê bigirim.

**PÊŞNIYARÎ Û DAXWAZÎ**

*Ji bo jinên trans ên ku di pêvajoya guncanî ya transî de ne, ji bo mesrefên epîlasyon-dobe yên ku pêwistiyên gelek hevalên jin ên trans pê hene divê her kes, nemaze jî hevalên xebatkar û aktivîst, di komeleyên xwe de hewl bidin û zorê li komeleyan bikin da ku rê li ber wan xebatan vebin.*

# PIRS-BERSIV Û TECRÛBEYÊN DERBARÊ RAGIHÎNA MEKANÎZMAYÊN EDLÎ DE

*"Li Stenbolê rastî şêlandinê hatim û min xwest ez ji bo lêgerîna mafê xwe biçim qereqolê; lê ez tirsiyam û neçûm."*

**1- Li Stenbolê rastî şêlandinê hatim û min xwest ez ji bo lêgerîna mafê xwe biçim qereqolê; lê ez tirsiyam û neçûm. Li Urdunê welatê ku ez lê dijiyam dema pirsgirêkên wiha derketana jî em nediçûn qereqolê. Lewre li wê derê jî ji ber ku bes em trans bûn li rastî cihêkariyê diman û me nedikarî doza mafên xwe bikira. Li Tirkiyê jî rewş wiha ye?**

- Teqez, divê mirov dev ji gilîkirinê bernede. Teqez divê mirov doza mafê xwe bike û gilî jî bike. Rast e ku trans di gihîştina hiqûqê de pirsgirêkan dijîn. Lê ji aliyê xwe bihêz hîskirinê de, dikare bi komeleyan re, bi aktîvîst û rêxistinan re bikeve nav têkiliyê û bi vî awayî bikaribe doza mafên xwe bike. Li Tirkiyê baweriya li hember hiqûqê ji bo her kesî pirsgirek e; lê ji ber ne trans in nabe asteng ku em doza mafê xwe nekin. Divê mirov doza mafê xwe bike; lêbelê dibe kêmasî û pirsgirêk derkevin.

*"Penaber gelek caran naçin, gilî nakin. Ez dikarim li ser navê xwe vî tiştî bibêjim, dema ez gelek caran weku gilîkar çûm, her ji ber çi be yê sûcdar ez derdiketim."*

**VEGUHESTINA TECRÛBEYÊ:**

*Ez jî dixwazim vê lê zêde bikim: Ji ber ku ez trans im û li Tirkiyê me ji her tevgera xwe ditirsim, mînak ez pirsgirêkekî dijîm, dixwazim biçim gilî bikim. Rêveberiya koçê bi vê dihese, wan kesên ku zêde gilîyan dikin tespît dikin. Paşê ev kes ji aliyê serîlêdan û dosyaya penaberîyê ve pirsgirêkan dijî. Dosyaya te dibe ku betal nebe; lê kirarî tên hêdîkirin, heta tên sekinandin. An jî ji UNHCRyê re dibêjin ku ew kes tim gilî dike. Ji ber vê dibe ku tu di dosyaya xwe pirsgirêkan bijî, ji ber vê sedemê penaber gelek caran naçin, gilî nakin. Ez dikarim li ser navê xwe vî tiştî bibêjim, dema ez gelek caran weku gilîkar çûm, her ji ber çi be yê sûcdar ez derdiketim. Weku mînak hezkiriyê min ê berê min tehdît kir, tundî li min kir. Ez çûm, bûm gilîdar. Dema ez çûm qereqolê hatim binçavkirin û kesî ji min bawer nekir. Dema ez çûm min sewqî edlîyeyê kirin. Min li wê derê rewş ji wan re got. Paşê wiha hatim berdan. Li zanîngehê jî pirsgirêkên wiha hatin serê min. Tew sala dawîn ji min re wiha hat gotin: "Tu neyê zanîngehê, jixwe em ê te mezûn bikin. Tu kengî tê zanîngehê pirsgirêk derdikevin." Çi heyf û mixabin ku em ne sedemê van pirsgirêkan in, tenê mexdûr in. Ew wê nabînin. Weku mînak ez derdikevim derve, ji aliyê hinekan ve rastî êrîşên bi devkî têm. Têm tacîzkirin, hin kes erîşa fîzîkî dikin, tundîyê li min dikin. Em tim li mal dimînin, dernakevin derve. Transên penaber, di vê xalê de pirsgirêkên mezin hîn dijîn. Mixabin ku rewş ev e.*

**Parêzer Aylin:**

Gava li Tirkiyê ji hêla zagonên cezayê ve sûçek tê kirin, divê pêvajoya lêpirsîn, peyketin û vekolîna wê ji hebûn an jî tunebûna nasnameyê cûdatir bê rêvebirin. Ji ber vê yekê keseke penaber be jî hemwelatiyê Tirkiyê be jî dema li rastî bûyerekê hat û bû mexdûrê sûçekî, mafên kesane yên zagonî hene ji bo gilîkirinê. Dikare biçe qereqolê, dikare biçe dozgeriyê jî. Ger hewce bê dîtin dikarin biryara tevdîrê li ser qanûna hejmar 6284 bê stendin. Lê ji bo penaberan dibe ku encamên cûda hebin. Ji bo penaberan, ger ji bo kesekî giliyek hebe ew kes di rewşa gumandar de be, derheqî wî/wê kesî de miamele tê kirin; piştre li hêviya miameleya Rêveberiya Koçê ya Bajêr dihêlin. Li wir jî dibe ku têxin bin çavdêriya îdarî. Di rewşa ku penaber dibe mexdûrê sûcekî, ger ew kes mexdûr be jî ku nasnameya wî/wê tunebe îxtîmala ku wî kesî têxin bin çavdêriya îdarî, yan jî bê şandin heye. Mînak nasnameye wî/wê kesî/ê li bajarekî din be û bixwe jî li bajarekî din mexdûr bibe. Di rewşên wiha de, ji ber tirsa ku bê şandin, mexdûr be jî ew kes xwe ji lêgerîna mafê xwe paşve dikişîne. Carinan kesên ku nasnameyên wan hene jî ji ber sedema xerabkirina pergala civakê, dikare bê binçavkirin. Bi taybetî di rewşên tundî de, ji bo binçavkirinê

rola komeleyan a parastinê heye. Ango kesek penaber be, tenê ji ber ku bê nasname ye di dema gilîkirinê de bê binçavkirin jî di vir de ji bo neşandina wî/wê ewleyiya zagonî heye. Hewce bike mafê ew kesî yê hildana biryara tevdîrê jî bigire heye. Ango dema kesek mexdûr bû divê nebêje ku “Ez penaber im, nikarim tu tiştî bikim. Yên min bişînin”, pêşiyê alîkariyeke hiqûqî hilde, pirsgirêk û metirsiyan binirxîne dê baştir bibe. Bi taybetî di sûcên zayendî de, di pêvajoya berhevkirina delîlan de, dem pir girîng e. Ji ber ku serîlêdana wî/wê bê encam nemîne û delîl neyên wendakirin, di nava 24-48 seetan de gihîştina bi lez a mekanîzmayên alîkariya hiqûqî pir girîng in. Dê beşeke parastinê hebe, ji vê re biryardayîna bi kirde re pir girîng e.

**Ez li Hatayê dijîm. Ez dixwazim bi awayekî pir bi lez dest bi tedawiya hormonan bikim. Ger çûyîna dadgehê bivê, ez qet neçûme dadgehê heta niha. Li dadgehê merhele çi ne?**

**-Prz. Aylin:**

Li Tirkiyê kesên ku rewşa wan a aborî ne baş be, di bin alikariya edlî de, xwediyê wî mafî ne ku dikarin xwastina bêpere ya parêzeran bikin û her mesrefên dadgehê nedin. Ji bo vê qanûneke zagonî heye. Ev qanûn penaberan jî dihewîne. Lê belê ger dozek bê vekirin û hûn bixwazin parêzerek bi doza we re mijûl bibe, hûn dikarin serî li Servîsa Alikariya Edlî ya ku li bajarê we ye, bidin. Ger hûn biçin baroya wî bajarî ku hûn lê qeydkirî ne, bi belgeyên îkametgah û xizaniyê ve dikarin serî lê bidin, atamaya parêzerên tê çêkirin, belgeya îkametgah û xizaniyê li muxtariyê tê standin. Navnîşana we girêdayî ku be divê belge li wê muxtariyê bê standin.

Ji bo ku hûn dest bi pêvajoya zagonî bikin, divê hûn li dadgehê doza “destûra guherandina zayendê” vekin. Ger hûn bixwazin dozê bi xwe bişopînin, ne hewce ye ku hûn parêzerekî bigirin. Hûn dikarin dozê bi xwe jî vekin. Beriya vekirina dozê divê daxwaznameyeke dozê bê amadekirin. Divê sûretekî vê daxwaznameyê tev li dosyayê bê kirin. Divê fotokopîya nasnameyê jî weku pêvek li daxwaznameyê bê zêdekirin. Daxwaznameya dozê ji ber ku xala herî girîng e, dema daxwazname tê nivîsandin, ji komeleyên piştgîriya hiqûqî bê hildan dê baştir bibe. Li gor qayîdeyan dema hûn dozekê vedikin, di destpêkê de hûn mafdar bibin an jî nebin, ji we avansa xerç û mesrefan tê standin. Ev mesref li gor cûreya dozê diguhere. Ger rewşa we ya aborî têra dayîna vî pereyî neke, divê doza we li ser daxwaza alîkariya edlî vebe û ev rewş di daxwaznameya dozê de bê diyarkirin. Weku ku min ravekir hûn bikaribin belgeya xizaniyê bigirin, divê hûn vê jî li daxwaznameya dozê zêde bikin. Ev hemû di nav wê dosyaya dozê de cih digirin ku em jê re dibêjin dosyaya pembe.

Baş e hemû belgeyên we amade ne, hûn ê biçin ku? Mînak, divê hûn li Hatayê bi daxwaznameya xwe û bi tiştên lê zêde biçin dadgeha Hatayê, serî li Buroya Tewzîhê ya Dadgeha Hiqûqî bixin. Li vê derê belgeyên di dosyaya we de, dê derbasî sîstemê bikin. Piştre mesrefa ku hûn ê bidin tê tespîtkirin û ewraqekê didin we. Bi vê belgeyê ve hûn li wezneyê pereyê mesrefan didin. Belgeya ku hûn ji wezneyê digirin jî dibin radestî Buroya Tewzîhê dikin, memûr wê belgeya ku nîşan dide we pere razandiye digire û kirariyan tevan dike. Bi vî awayî doza we tê vekirin. Formeke tewzîhê didin we. Di vê formê de agahiyên wek doza we dê li kîjan dadgehê be, bi kîjan hejmara dosyayê ve bê nîşan dayîn, tev cih digirin. Bi alikariya van agahiyen, hûn dikarin teqîb bikin da ku doza we di çi rewşê de ye. Dema dîroka celseyê diyar dibe we agahdar dikin. Teqez hûn an jî parêzerê we divê tev li celseyê bibe. Wisa nebe dosya ji misameleyê tê rakirin. Dadgeh dema darizandinê biryarekê ji bo daxwaza we ya alîkariya edlî jî dide. Ger daxwaza we bê redkirin, ji bo razandina mesrefan wextek tê dayîn. Di nava vî wextî de razandina pereyên mesrefan pir muhîm e, wisa nebe dibe ku doz bê redkirin. Ez wiha dikarim vekirina dozê kurtî vebêjim.

**Bidawîanîn:**

***Tu kes li vir bi tenê nîn e, em tev bi piştgirtinê ve bihêz in, bi hev re bihêz in. Ger em li vir pir şad û bê pirsgirêk bijiyana, dê tiştekî weku "welatekî sêyem" tune bûya. Helbet pirsgirêkên me hene, em ê biaxivin û bi hev re bin.***

# ENCAM Û PÊŞNIYAR

LGBTÎ+yên penaberên ku ji bo îltîcayê serî li Tirkiyê dane ji bo parastina navneteweyî û qeydên parastina demkî beralîyê bajarên pêgirtî dibin. Dema li benda pêvajoya bicihkirina welatê sêyem dimînin, li wan bajaran bi îmkanên xwe ve jiyana xwe birêve dibin. Li gel pirsgirêkên gihîştina dadê, starbûna bi ewle û gihîştina pîyaseya kar, negihîştina mafê tendurîstiyê jî ji bo LGBTÎ+yên penaber û koçber dibe pirsgirêkeke jîndarî.

Li gor tecrûbeyên ku di Bernameya Mafên Tendurîstîya LGBTÎ+yên Penaber de, tê serwextkirin ku LGBTÎ+yên koçber û penaber li bajarên ku lê îkamet dikin ji aliyê gihîştina mafê tendurîstiyê ve pêrgî gelek pirsgirêkan tên. Tê dîtin ku kesên xwediyê statû û serîlêdanên parastina navneteweyî li dor mijarên wek tengasiyên ku LGBTÎ+ lê rast hatine, pêkanîna verastkirinên zagonî, astengiya ziman û gilîyen derheqê cihêkariya xebatkarên tendurîstiyê de dikin, hatine kom kirin. Hatiye fêhmkirin ku LGBTÎ+yên ku ne xwediyê tu îkametên zagonî ne, ji xêynî rewşên acîl ve hema hema nikarin bigihêjin tu xizmetên tendurîstiyê. Ev rewşa ku ne li gorî peymanên navneteweyî ne ji aliyê mafên tendurîstiyê ve wek binpêkirin tê nirxandin.

Hatiye tespîtkirin ku ev astengiyên ku li pêşiya gihîştina xizmetên tenduristiyê yên LGBTÎ+yên koçber û penaber di pêvajoya pandemiyê ya COVİD-19ê de zêdetir bûne. Di vê pêvajoyê de pirsgirêka ku herî zêde hatiye ziman nedestxistina maske û dezenfektanan e. Ji ber ku testên wek HIV û HPVyê nehatine kirin, di teşhîs û tedawiyan de pirsgirêk hatine jiyîn. Zehmetiya gihîştina dermanên tedawî yên hormonan û nexweşiyên kronîk, tesîreke pir mezin li ser jiyana LGBTÎ+yên koçber hiştiye. Ji bo penaberên ku di pêvajoya guncanî ya zayendê de ne, girtîbûna klînîkan û taloqkirina operasyonan barê derûnnasiya pêvajoyê girantir kiriye. Ligel vê hatiye vegotin ku xizmetên tendurîstî yên derûnî yên ku pêşkêşî LGBTÎ+'yên penaber kirine kêm mane.

Wek tecrûbeyên penaber ên LGBTÎ+yên ku tev li **"Bernameya Tendurîstiya LGBTÎ+yên Penaber"** û wek komeleya HÊVÎ LGBTÎ+ di mijara tenduristiyê de li gor hevdîtinên ku me li qadan pêk anîne pêşniyariyên ji bo çareserkirina binpêkirinên mafan hatiye pêşkêşkirin, li jêrê hatiye rêzkirin.

Ji bo helkirina pirsgirêkên ku li gor berdestiyan hatine tespîtkirin, pêşniyarên çareserkirinê ku ji aliyê komeleya HÊVÎ LGBTÎ+yê hatiye pêşkêşkirin, li jêrê hatine rêzkirin:

- Mafê tenduristiyê yek ji wan mafên bingehîn a jiyana mirovan e, divê bi vê hişmendiyê tevbigerin, divê verastkirinên zagonî bên kontrol kirin, qanûnên ku ji gihîştina mafên tendurîstî yên LGBTÎ+yên koçber û penaberan re dibin asteng, divê bên rakirin.
- Divê LGBTÎ+yên koçber û penaber li navêndên tendurîstiyê bi awayekî berfireh û berdewamî xizmetan bikaribin bi zimanê xwe yê zikmakî ve bibînin û divê verastkirinên ji bo rakirina astengî ya li hemberî ziman, bên kirin.
- Ji bo di dema gihîştina xizmetên tendurîstiyê yên LGBTÎ+yên koçber û penaberan de divê pratîkên parastina mahremiyeta wan, bên zêdekirin.
- Ji aliyê Wezareta Tendurîstiyê ve, li navendên tenduristiyê ji bo perwerdekirina xebatkarên tenduristiyê li hemberî LGBTÎ+fobî, cihêkarî û nijadperestiyê divê xebat bên birêvebirin.
- Di benda 69an a Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyaniyan de, di hejmar 6458an de û di benda 20an ya Rêziknameya Parastina Demkî de hatine diyarkirin ku di rewşên "kesên weku tenduristiya giştî dixin metirsiyê hatine nirxandin" qanûnên derbarê dersînorkirina kesan de divê werin rakirin.
- Bi guhertina ku Qanûna Parastina Navneteweyî û Biyaniyan hejmara 6458an ya di sala 2019an de di mijara sîgortaya giştî de divê sînordanîna yek-sale were rakirin, xwediyên statû û serîlêdanên parastina navneteweyî bêyî sînordanîna demkî divê belaş bigihîjin xizmetên tenduristiyê.
- Di rewşên wek redkirina serîlêdana parastin a navneteweyî de, heta ev biryar bê misogerkirin divê kesê ku serî lê daye bikaribe ji sîgortaya tenduristiyê istifade bike.
- LGBTÎ+yên ku xwediyên statu û serîlêdana parastin a navnetewî ne, tedawiya wan ya nexweşiyên kronîk, bêyî ku ew berî hatina welêt hebû yan, divê ku bêpere were kirin.
- Divê dermanên hormonan ên koçber û penaberên ku di pêvajoya guncanî ya zayendê de ne têxin bin sigortaya tendurîstiyê ya giştî; hemû operasyonên guncaniyê divê bê pere bên kirin.

- Divê gihîştina dermanan a penaberên ku bi HIVyê ve dijîn, bi awayekî birêkûpêk bên dabînkirin; ji bilî vê divê ji bo pêşîlêgirtina stîgmatîzasyon û HIVfobiya ku penaber lê dûçar mane, tevdir bê girtin.
- Divê mekanîzmayê serîlêdan û gilîkirinê bên sazkirin ji bo ku LGBTÎ+yên penaber bikaribin ji aliyê pirsgirêkên gihîştina xizmetên tendurîstiyê ve bikaribin bi zimanê xwe yê zikmakî ve piştgiriyê bigirin.
- Gelek LGBTÎ+yên koçber û penaber li welatên wan û li Tirkiyê bûnê xwediyê tecrûbeyên neyînî, divê ev rewş bê ber çavan û zêdetir xebatên ji aliyê parastina rewşa wan a başî ya derûnî ve bên kirin.
- Di pêvajoya pandemiya COVİD-19ê de, divê hestiyariya LGBTÎ+yên koçber û penaber bê ber çavan, bi vî awayî ji bo gihîştina xizmetên tendurîstiyê divê tevdîrên têrtijî bên hildan.
- Di pêvajoya COVİD-19ê de, divê derfeta gihîştina anonîm a testên weku HIV, HPV û hwd. bên çêkirin û divê têngasiyên ji aliyê teşhîs û tedawiyan de bên sererastkirin.
- Divê di mijara derziya COVİD-19ê de, nediyariyên derbarê LGBTÎ+yên koçber û penaber ên neqayidkirî de ji holê bên rakirin, divê bê muamele tev li stratejiya bikaranînê ya neteweyî ya derziya COViD-19ê bibin û di komên aşîkirinan de bên bicîhkirin.
- Ev xebatên ji bo LGBTÎ+yên koçber û penaberan divê bi hevkariya kirdeyan û civaka sîvîl re bên lidarxistin.

HÊVÎ LGBTÎ

RAPORA MAFÊ TENDURISTÎ Û CIHÊKARIYÊ YA LGBTÎ+ YÊN PENABER